# Nûbihar

**KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ**

■ Haîkû **Berken Bereh** ■ Rehm û Wefa **Rojen Barnas** ■ Di Adata û Rusûmatname'ê Mela Mehmûdê Bazîdî de: Eslê Kurdan û zimanê wan **Murad Celalî** ■ Deh Haîkû **Sidîq Gorîcan** ■ Hevnasîna Nûbiharê û çanda xwendinê **Adar Jiyan** ■ Di Serjimara Yekemîn ya 1927an de Gelheya Bajarên Kurdistanê û Rewşa Zimanê Kurdî **Bahadîn Hawar Kerboranî - Emrullah Deniz** ■ Çi dibe loo zemano **Berken Bereh** ■ Qeda bi finda derewîn keto **M. Zahir Ertekin** ■ Hejar **Maruf Xeznedar** Ji Soranî: Ziya Avci ■ Çîrçîrok û talana li ser 'çîrçîrokan' **Cîhan Roj** ■ Bo derdê me nîne derman hewara **Hafizê Şirazî** Wergera ji Farisî: Hayrullah Acar ■ Günter Grass û berhema bi navê Dahola Tenekeyî **Shahîn Bekir Soreklî** ■ Çilê 2017a **Sîpanî** ■ Seîdê Kurdî û Mistefa Paşayê Keçel **Abdullah Can** ■ Serboriya Keran **Nejla Sado** ■ Were îro me bi te karek heye **Mewlana Celaleddînê Romî** Wergera ji Farisî: Hayrullah Acar ■ "Neke bi serê kesan!.." **Besra Pîranî** ■ Fikra Azad **Johann Wolfgang von Goethe** Wergera ji Almanî: Abdullah İncekan ■ Qani': Helbestvanê Mezlûman **Yasîn Osman Hesen** Ji Soranî: Mehmet Yıldırımçakar ■ Kilamên Litfiya Mala Şûşa **Evdî Hesqera-Mahmûdê Hesbêra** ■ Firmêsk **N. Mem Dem** ■ Du Mirov **Têkoşer Kurd** ■ Ax bang dide diqîre **Merve Şivan** ■ Mela Hesenê Kaçkarî û mersiyeyên wî yên li ser Şêx M. Maşûq **Hanefi Taşkın** ■ Şîna Kalerindê Dilovan **Talat İnanç**

## Versiyoneke Garşûniya Kurdî ya Mem û Zînê

Mustafa Dehqan

## Kurtedîroka Berhevkirina Stranên Kurdî

Mesûd Serfiraz

## Di Belgeyên Dewletê de Bajarê Agirî

Nihat Öner

## Bi Aslîka Qadir re Hevpeyvîn

Nihad Gültekin




ISSN 2147-8821

141

SAL: **25**
CILD: **21**
PAYÎZ 2017
BIHA: **8 TL**

# Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ
(Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.
Xwedî û Gerînendeyê Weşanê/Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü
SÜLEYMAN ÇEVİK

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 22/29 Vezneciler/ Fatih - İstanbul
Tel&Fax: (0212) 519 00 09 www.nubihar.com nubihar@gmail.com

**Nûnertiya Almanya:** Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 7922968

**Çapxane:**
Alioğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A
Bayrampaşa/İstanbul Tel: 212 612 95 59

**Yayın Türü:** Yerel Süreli
**Berdêla abonetiya salane:** Tirkiye: 35 TL, Welatên din: 25 EURO, 30 $

**Hesabê Bankê:**
Pak Ajans Yayıncılık Turizm ve Dış Tic. Ltd. Şti.
İş Bankası Laleli Şubesi: 1084 - 0452003
IBAN: TR24 0006 4000 0011 0840 4520 03

*Nûbihar ji 3 mehan carekê; Payîz, Zivistan, Bihar û Havînê tê weşandin.*
*Mesûliyeta ramanên di nivîsaran de aîdê nivîskaran e.*
*Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên vegerandin.*

- Haîkû **Berken Bereh** ... 4
- Versiyoneke Garşûniya Kurdî ya Mem û Zinê **Mustafa Dehqan** Wergera Ji Îngilîzî: M. Şirin Filiz ... 6
- Rehm û Wefa **Rojen Barnas** ... 11
- Di Adata û Rusûmatname'ê Mela Mehmûdê Bazîdî de: Eslê Kurdan û zimanê wan **Murad Celalî** ... 12
- Deh Haîkû **Sidîq Gorîcan** ... 19
- Hevnasîna Nûbiharê û çanda xwendinê **Adar Jiyan** ... 20
- Kurtedîroka Berhevkirina Stranên Kurdî **Mesûd Serfiraz** ... 24
- Di Serjimara Yekemîn ya 1927an de Gelheya Bajarên Kurdistanê û Rewşa Zimanê Kurdî **Bahadîn Hawar Kerboranî - Emrullah Deniz** ... 30
- Çi dibe loo zemano **Berken Bereh** ... 39
- Di Belgeyên Dewletê de Bajarê Agirî **Nihat Öner** ... 40
- Qeda bi finda derewîn keto **M. Zahir Ertekin** ... 47
- Hejar **Maruf Xeznedar** Ji Soranî: Ziya Avci ... 48
- Çîrçîrok û talana li ser 'çîrçîrokan' **Cîhan Roj** ... 53
- Bo derdê me nîne derman hewara **Hafizê Şîrazî** Wergera ji Farisî: Hayrullah Acar ... 55
- Günter Grass û berhema bi navê Dahola Tenekeyî **Shahîn Bekir Soreklî** ... 57
- Çilê 2017a **Sîpanî** ... 58
- Seîdê Kurdî û Mistefa Paşayê Keçel **Abdullah Can** ... 61
- Rojhilatzan, hunermend Aslîka Qadir: Asûriyan jî, Ermeniyan jî şayî û şînên xwe bi stranên Kurdî kirine ***Hevpeyvîn:* Nihad Gültekin** ... 66
- Serboriya Keran **Nejla Sado** ... 74
- Were îro me bi te karek heye **Mewlana Celaleddînê Romî** Wergera ji Farisî: Hayrullah Acar ... 77
- "Neke bi serê kesan!.." **Besra Pîranî** ... 78
- Fikra Azad **Johann Wolfgang von Goethe** Wergera ji Almanî: Abdullah İncekan ... 80
- Qanî': Helbestvanê Mezlûman **Yasîn Osman Hesen** Ji Soranî: Mehmet Yıldırımçakar ... 81
- Kilamên Litfiya Mala Şûşa **Evdî Hesqera-Mahmûdê Hesbêra** ... 83
- Firmêsk **N. Mem Dem** ... 85
- Du Mirov **Têkoşer Kurd** ... 86
- Ax bang dide diqîre **Merve Şivan** ... 87
- Mela Hesenê Kaçkarî û mersiyeyên wî yên li ser Şêx M. Maşûq **Hanefi Taşkın** ... 88
- Şîna Kalerindê Dilovan **Talat İnanç** ... 94

ترکیه جمهوریتی

باشوکالت

استاتستیق مدیریت عمومیه سی

عمومی نفوس تحریری

٢٨ تشرین اول ١٩٢٧

— موقت نتیجه‌لر —

# Di Serjimara Yekemîn ya 1927an de Gelheya Bajarên Kurdistanê û Rewşa Zimanê Kurdî*


BAHADÎN HAWAR KERBORANÎ- EMRULLAH DENİZ

باشوکالت مرکزی ایستاتستیق مدیریت عمومیه‌سی نشریاتندن

عدد : ٢

Armanca vê gotarê bi ronahiya belgeyên fermî yên dewleta Tirk, analîzkirina polîtîkayên gelheyî ya dewleta Tirk, nemaze jî ya li hemberî Kurdan e. Serjimara salên 1920-30an di nav lêkolîn û qadên akademiyê de mijareke populer e û encamên wê ji bo têgehiştina polîtîkayên dewletê yên îro jî girîng in. Gelheya Kurdistanê jî di vê çarçoveyê de mijareke populer û girîng e, bi teybetî jî serjimara sala 1927an ya ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye kirin û rewşa zimanê Kurdî nîşan dide, dê di vê gotarê de werin gengeşî kirin.

Bi avakirina Komara Tirkiyeyê re ji bo Kurdan çîrokeke nû û dijwartir dê dest pê bike. Piştî Serhildana Şêx Seîd polîtîkayên komarê gelekî dijwartir dibin û bi derxistina *"Şark Islahat Planı"* û li gorî nêrîna fermî Kurd bi eslê xwe Tirk in lê êdî bûne Kurd, ji vir pê ve Kurd mecbûr in ku bi Tirkî biaxivin û êdî nikarin bi zimanê xwe li bazar, dibistan û di avahiyên fermî de biaxivin. Ger bi Kurdî biaxivin jî dê ji bo her peyveke Kurdî werin cezakirin. Bi derxistina vê qanûnê re dewlet li bajarên Kurdistanê gelek bi hêz dibe û ev qanûn li ser Kurdan tesîreke mezin dike. Dewlet dest bi kampanyaya "Vatandaş Türkçe Konuş" dike[1]. Di sala 1927an de bi navê "Bazı Eşhasın Şark Mıntıkasından Garp Vilayetlerine Nakline Dair Kanun" qanûnek tê derxistin û bi vê qanûnê re gelek mirov tên sirgûnkirin[2].



ولايت و قضا اعتباريله توركيه نفوسی

— موقت رقملر —

آنقره ولايتی

| قضانك اسمی | قادين | اركك | يكون |
|---|---|---|---|
| آنقره مركزی | ٤١٧١٤ | ٦٥٩٢٧ | ١٠٧٦٤١ |
| آياش | ١٢٠٦٣ | ١٠٣٤٠ | ٢٢٤٠٣ |
| بكبازاری | ١١٦٦١ | ٩٦٧٩ | ٢١٣٤٠ |
| بالا | ١٣٥٦٥ | ١٢٧٤٨ | ٢٦٣١٣ |
| بولاطلی | ٨٣٦٤ | ٨٢٩٦ | ١٦٦٦٠ |
| چبوق آباد | ١٣٤٧٣ | ١٢٥٠٠ | ٢٥٩٧٣ |
| حيمانه | ١٤٨٢٠ | ١٤٢٦٥ | ٢٩٠٨٥ |
| قلعه جك | ١٩٩٩١ | ١٨٣٢٤ | ٣٨٣١٥ |
| كسكين | ٢٥٦١٥ | ٢٣٤٣٥ | ٤٩٠٥٠ |
| نعللوخان | ٧٥٨٩ | ٦٦٤٨ | ١٤٢٣٧ |
| بيان آباد | ٢٩٠٠٣ | ٢٤٧٠٦ | ٥٣٧٠٩ |
| يكون | ١٩٧٨٥٨ | ٢٠٦٨٦٨ | ٤٠٤٧٢٦ |

استانبول ولايتی

| | | | |
|---|---|---|---|
| استانبول مركزی | ١٢٢٤٨١ | ١٣٩٠٢٣ | ٢٦١٥٠٤ |
| آطه لر | ٦٤٦٠ | ٥٢٣١ | ١١٦٩١ |
| اسكدار | ٧٨١٦٩ | ٧٦٩٢٣ | ١٥٥٠٩٢ |
| بك اوغلی | ١٤٨٥٠٠ | ١٤٥٥٢٥ | ٢٩٤٠٢٥ |
| باقر كوی | ١٠٥٤٩ | ٩٨٩٢ | ٢٠٤٤١ |

[*] تحرير نتيجه‌لری نفوس حاضره يه يعنی ٢٨ تشرين اول ٩٢٧
بولنان نفوس موجودينه كوره ترتيب وجمع ايدلشدر.

Di dema Osmaniyan de jî çend serjimar hatine çêkirin lêbelê em li gorî encamên van serjimaran der barê gelheya Kurdistanê û Kurdan de bi awayekî zanistî agahdar nabin, ji ber ku gelek kêmasiyên van serjimaran hene. Komara Tirkiyeyê cara yekem di sala 1927an de serjimarekê pêk tîne[3]. Serjimar bi zimanê Osmanî hatiye çêkirin, lê îstatîstîkên vê serjimarê di sala 1929an de tên Latînîzekirin û bi Fransizî jî di nav belgeyan de cihê xwe digire. Her ji ber wê jî gelek belgeyên ku emê di vê gotarê de bi kar bînin zimanê wan bi Tirkî û Fransizî ne. Armanca vê gotarê wekî me li jor jî diyar kiriye, tesbîtkirina gelheya bajarên Kurdistanê, rewşa zimanê Kurdî û hinek polîtîka û nêrînên dewletê ne.

Beriya pêkanîna serjimarê gelek amadekarî tên kirin. Em dixwazin ji bo vê hinekî li ser gotinên "Başvekil İsmet Paşa Hazretleri" bisekinin. Îsmet Paşa bi navê *"Umumî nüfus tahriri hakkında Türkiye ahalisine beyanname"* beyannameyekê dinivîse. Ev nivîs û belge ji bo fêmkirina niyet û polîtîkayên dewletê gelekî balkêş e. Îsmet Paşa di vê nivîsê de dibêje "her Tirk ji xwe dipirse ku gelo gelheya vî welatê ku bi xwîn û qehramaniya birayên me hatiye avakirin çi qas e? Û divê her hevwelatiyê Tirk vî karî bi dilê xwe bike û vî karî wekî wezîfeyeke welatî bibîne. Hem Tirk û biyaniyên ku li welatê me yê mêvanperwer dijîn yê werin jimartin."[4] Wekî mirov ji vê belgeyê jî fêm dike rêvebirên dewletê hemû kesî wekî Tirk dibînin û axa li ser dijîn jî wek axake pîroz qebûl dikin.

Di formên ku ji bo serjimarê hatine amadekirin

* *Em ji bo alîkariya wan, ji Zekî Gürür, Mesûd Serfiraz, Serhad Bozkurt û Endemên Koma Xebatên Kurdolojiyê re spasiyên xwe dişînin. (Bahadîn Hawar Kerboranî-Emrullah Deniz)

Ehemmiyetleri sırasile her vilâyette yedi yaşını mütecaviz nüfusta okuma bilenlerin yüzde nisbeti
La proportion P. C. des personnes sachant lire parmi les habitants de 7 ans et plus
C — Kadın ve erkek yekûnunda — Dans les deux sexes

| VİLÂYETLER VILAYETS | % | VİLÂYETLER VILAYETS | % | VİLÂYETLER VILAYETS | % | VİLÂYETLER VILAYETS | % |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Hakâri | 1.85 | Maraş | 4.93 | İçel | 7.01 | Balıkesir | 10.50 |
| Van | 1.92 | Ş. Karahisar | 5.01 | Kastamonu | 7.12 | Burdur | 10.86 |
| Amasya | 2.29 | Erzurum | 5.04 | Erzincan | 7.33 | Rize | 10.87 |
| Bitlis | 2.60 | Çorum | 5.19 | Giresun | 7.33 | İsparta | 11.11 |
| Mardin | 2.96 | Çankırı | 5.28 | Trabzon | 7.62 | Kırklareli | 11.67 |
| Yozgat | 2.96 | Ordu | 5.49 | Cebelibereket | 8.13 | Mersin | 12.07 |
| Bayazıt | 3.47 | Elâziz | 5.54 | Konya | 8.17 | Çanakkale | 12.08 |
| Aksaray | 3.57 | Sinop | 5.67 | Niğde | 8.17 | Edirne | 12.23 |
| Tokat | 3.76 | Artvin | 5.79 | Zonguldak | 8.18 | Tekirdağ | 12.40 |
| Kars | 3.97 | Kırşehir | 5.95 | Kayseri | 8.35 | Ankara | 12.94 |
| Urfa | 4.02 | Sıvas | 6.17 | Manisa | 8.72 | Kocaeli | 13.44 |
| Bursa | 4.10 | Gaziantep | 6.25 | Aydın | 9.01 | Eskişehir | 14.17 |
| Gümüşane | 4.54 | Kütahya | 6.34 | Samsun | 9.27 | Bilecik | 15.50 |
| Diyarbekir | 4.61 | Afyonkarahisar | 6.62 | Muğla | 9.34 | İzmir | 21.22 |
| Malatya | 4.68 | Denizli | 6.80 | Bolu | 9.95 | İstanbul | 45.48 |
| Siirt | 4.75 | Antalya | 6.89 | Adana | 10.46 | | |

de gelek pirsên balkêş hene. Li gorî me di nav wê formê de pirsên herî balkêş û girîng beşa zimanê zikmakî û baweriyê/dînê ne. Bi daneyên wan pirsan em dikarin ku hinek jimaran bidin û bi van jimaran, der barê wê demê de analîzên xurttir bikin. Ya ku em dizanin pirsa zimanê zikmakî heta sala 1985an tê pirsîn, lê mixabin lêkolîner nikarin bigihin van belgeyên yên piştî sala 1965an, yên ku der heqê zimanê zikmakî de ne. Dewlet naxwaze van belgeyan bi lêkolîneran re parve bike[5]. Xaleke din a balkêş jî dewleta Tirk heta 1945an di pirsa kategoriya ziman de Kurdî, zimanekî tenê ye lêbelê bi 1950an re dewlet li gora xwe 3 (Kürtce-Kırmanca, Kırdaşça, Zazaca) zimanên hêremê/zaravayên din jî dixe nava formê[6] û di serjimara 1965an de kategoriya zimanê Kurdî wek 4 zimanan (Kürtçe, Kırmanca, Kırdaşça, Zazaca) tê nîşankirin, sedema çêkirina vê ji bo serê milet tevlîhev bikin e[7] û bi van pirsan re em dikarin bibêjin dewlet cara yekem wê hînî gelheya Kurdên Zaza bibe. Em dizanin dewleta Tirk her dem ji bo Zazayan xwedî plan û proje ye ku karibe wan ji Kurmancan veqetîne û herdem Zaza ji aliyê dewleta Tirk ve wek miletekî din tê nîşankirin. Di nav formê de bikaranîna peyva Zaza jî vê diyar dike.

Li gorî serjimara wê salê 63 bajar/wilayet hene, lê sînor û tenzîmkirina îdarî yên wan bajaran ji îro cudatir in. Li gorî encamên wê serjimarê gelheya Tirkiyeyê ya bi giştî 13.660.275 e[8]. Lê armanc û mijara vê gotarê ji gelheya Tirkiyeyê zêdetir gelheya bajarên Kurdistanê ye. Lewma jî emê bêhtir li ser bajarên Kurdistanê bisekinin. Pirsa ku werê pirsîn li vir ev e; gelo dewleta Tirk dît Kurd di dema 1960an de populer bûn û li Kurdistana Başûr hinek maf bi dest xistin, ji ber vê xwest Kurdên Bakur ji hev dûr bixe? Ji ber vê sedemê xwest Zazayan wek miletek cuda bide nîşandayin û hewl bide ku Zazayan ji Kurdayetiyê veqetîne?

Li gorî wê serjimarê li seranserê Tirkiyeyê kesên wê demê Kurdî dizanin bi tevahî 1.187.446[9] in. Li heşt bajarên Kurdistanê[10] ji sedî pêncî bêhtir mirov Kurdî dizanin û li sê bajaran[11] jî ji sedî çilê mirov Kurdî dizanin. Kurdî piştî Tirkî li Tirkiyeyê zimanê ku herî zêde tê axaftin e. Gelheya 16 bajarên Kurdistanê[12] 2.862.301 e[13].

Belgeyek din ya balkêş ku em dixwazin di çarçoveya vê gotarê de parve bikin ev e: Li gorî serjimara sala 1935an mirovên ku bi zimanê Kurdî dikarin bixwînin û binivîsin 29 (27 mêr û 2 jin) kes in.[14] Em dizanin ku gelek rewşenbîrên Kurd, ku xwendevan in, ji rejîma Kemalîst direvin û diçin Binxetê, lêbelê em dikarin bi rehetî bibêjin encama vê serjimarê û hejmara xwendewaran ku pir hindik

12 Anadili itibarile okur yazarlık (7 ve daha yukarı yaşlarda) (1000) — Literacy by mother tongue (7 years old and over) (1000)

| Sayım yılları / Census years | Toplam – Total: Toplam / Total | Türkçe / Turkish | Kürtçe / Kurdish | Rumca Ermenice Yahudice / Greek Armenian Jewish | Diğer diller / Other tongues | Erkek – Male: Toplam / Total | Türkçe / Turkish | Kürtçe / Kurdish | Rumca Ermenice Yahudice / Greek Armenian Jewish | Diğer diller / Other tongues | Kadın – Female: Toplam / Total | Türkçe / Turkish | Kürtçe / Kurdish | Rumca Ermenice Yahudice / Greek Armenian Jewish | Diğer diller / Other tongues |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Türkiye (Memleket toplamı) — *Turkey (Total of the Country)*** | | | | | | | | | | | | | | | |
| Bilenler - Literates | | | | | | | | | | | | | | | |
| 1935 | 2 517 | 2 290 | 29 | 104 | 94 | 1.846 | 1 696 | 27 | 55 | 63 | 671 | 594 | 2 | 49 | 26 |
| 1945 | 4 583 | 4 286 | 79 | 111 | 107 | 3.303 | 3 091 | 73 | 62 | 77 | 1 280 | 1 195 | 6 | 49 | 30 |
| 1950 | 5 770 | 5 373 | 119 | 126 | 152 | 4.054 | 3 779 | 105 | 60 | 110 | 1 716 | 1 594 | 14 | 66 | 42 |
| 1950 de : — *in 1950* : | | | | | | | | | | | | | | | |
| Öğrenciler - Student | 1 524 | 1 442 | 31 | 14 | 37 | 985 | 927 | 25 | 7 | 26 | 539 | 515 | 6 | 7 | 11 |
| Öğrenci olmayan - Not student | 4 246 | 3 931 | 88 | 112 | 115 | 3.069 | 2 852 | 80 | 53 | 84 | 1 177 | 1 079 | 8 | 59 | 31 |
| Bilmiyenler - Illiterates | | | | | | | | | | | | | | | |
| 1935 | 9 850 | 8 387 | 1 043 | 76 | 344 | 4 110 | 3 464 | 478 | 26 | 142 | 5 740 | 4 923 | 565 | 50 | 202 |
| 1945 | 10 584 | 9 178 | 1 035 | 64 | 307 | 4 262 | 3 654 | 464 | 18 | 128 | 6 322 | 5 524 | 571 | 46 | 181 |
| 1950 | 10 896 | 9 226 | 1 242 | 48 | 380 | 4 324 | 3 576 | 580 | 15 | 153 | 6 572 | 5 650 | 662 | 33 | 227 |
| Toplam — *Total* | | | | | | | | | | | | | | | |
| 1935 | 12 367 | 10 677 | 1 072 | 180 | 438 | 5 956 | 5 169 | 505 | 81 | 210 | 6 411 | 5 517 | 567 | 99 | 228 |
| 1945 | 15 167 | 13 464 | 1 114 | 175 | 414 | 7 565 | 6 745 | 537 | 80 | 203 | 7 602 | 6 719 | 577 | 95 | 211 |
| 1950 | 16 666 | 14 599 | 1 361 | 174 | 532 | 8 378 | 7 355 | 685 | 75 | 263 | 8 288 | 7 244 | 676 | 99 | 269 |
| Bilenlerin nispeti % of the literates | | | | | | | | | | | | | | | |
| 1935 | 20.4 | 21.5 | 2.7 | 57.7 | 21.4 | 31.0 | 32.9 | 5.3 | 6.7 | 32.2 | 10.5 | 10.8 | 0.3 | 4.9 | 11.5 |
| 1945 | 30.2 | 31.8 | 7.1 | 63.4 | 25.8 | 43.7 | 45.8 | 13.6 | 7.7 | 38.0 | 16.8 | 17.8 | 1.1 | 5.1 | 14.0 |
| 1930 | 34.6 | 36.8 | 8.7 | 72.4 | 28.6 | 48.4 | 51.4 | 15.3 | 8.0 | 41.6 | 20.7 | 22,0 | 2.0 | 6.7 | 15.8 |

Şehirler (Nufüsu 5000 den fazla) · 1950 de — Cities (Population over 5000) · In 1950

hatî nîşandayin xelet e. Wekî tê zanîn di sala 1924an de medreseyên Kurdan ji aliyê rejîma Kemalîst ve tên girtin, lê em dizanin ku di wan medreseyan de bi sedan seyda û mela dizanîn bi Kurdî bixwînin û binivîsin. Ji bilî wê em dîsa dizanin ku di serdema Osmanî û Tirkîyeyê de gelek pirtûk bi Kurdî hatine çapkirin û her wisa nivîsandina Kurdî jî heye.[15] Li gorî encama wê serjimarê bajarên ku xwendin û nivîsandina wan herî kêm e, gelekê wan bi taybetî bajarên Kurdistanê ne.[16] Di wê lîsteyê de ji pênc bajarên ku xwendin û nivîsandina wan kêm e, jê çarê wan bajarên Kurdistanê ne[17].

Li gorî encam û analîza wê serjimarê, em dixwazin balê bikşînin ser hinek mijarên din ên balkêş. Di serî de, di nav 63 bajaran de bajarê Dêrsimê tuneye. Hinek leşker û rêvebirên dewletê pêşiya 1927an diçin Hozat/Dêrsimê ji bo ku mirov û hêremê nas bikin[18]. Lêbelê em hê jî dikarin bi rehetî bibêjin ku heta 1927an jî dewlet neketiye Dêrsimê û hikmê xwe û desthilatdariya xwe li ser wê derê ferz nekiriye. Hinek herêmên ku di nav sînorê Dêrsimê de ne, bi taybetî jî cihên wekî Çemîşgezek û Nazimiyê di warê idarî de bi bajarên din ve girêdayî ne. Xaleke din a balkêş jî hejmara Kurdan ên li Stenbolê ne. Li gorî wê serjimarê hejmara Kurdên li Stenbolê 3.365 e[19]. Li ser vê babetê mirov dikare pirsekê li vir bipirse, gelo çi hat serê wan Kurdên ku li Stenbolê dijiyan? Em dizanin ku hinek Kurd beşdarî Şerê Cîhanê yê Yekem[20] bûn, lê dîsa ev hejmar bi nêrîna me û çavkaniya wê demê, serjimara Kurdên Stenbolê destnîşan nake. Ji bilî van çavkaniyên fermî yên dewletê, dema ku mirov li çavkaniyên alternatîf, nemaze jî li yên Kurdan dinihêre, ev hejmar serjimara Kurdên ku li Stenbolê dijîn destnîşan nake. Bo nimûne dema ku mirov li kovara *Hetawî Kurd* dinihêre, di wir de di hejmara kovarê ya sêyem de serjimara hemalên Kurd yên li Stenbolê dijîn wekî 50 hezar tê destnîşankirin.[21]

Wekî me li jor jî got gelheya 16 bajarên Kurdistanê di encamên wê serjimarê de wekî 2.862.301 e; lê wekî tê zanîn 12 sal beriya serjimarê, fermana Ermenan li vê coxrafyayê hate rakirin û mirov dikare bibêje ku gelek Ermen ji axa xwe hatin bidûrxistin û gelek ji wan jî hatin kuştin[22]. Sedemeke din ya kêmbûna gelheya bajarên Kurdistanê jî ev e; di sala 1914an de li gorî belgeyên Osmanî û patrîkê Ermenan hejmara Ermeniyan pirr zêde ye[23].

## Encam

Polîtîkayên serjimariyê yên dewletan, gelek caran çavkaniyên dewletan bixwe ne ku bikaribin neteweke an komeke dînî/mezhebî li gorî dilê xwe biafirînin an jî komeke ku ne li gorî dilê wan e di

paşerojê de ji ser rûyê erdê rakin. Bi van daneyên serjimarê, dewleta Tirk êdî dizane ku çend mirov li ku derê bi Kurdî dizanin û êdî polîtîkayên xwe li gorî vê rastiyê li dar bixe û bimeşîne. Dewleta Tirk heta sala 1945an, di formê serjimarê de, di beşa zimanê zikmakî de Kurdî tenê ye, di formê de tu zarava tunene. Lê di serjimara 1950an de dewlet vê pirsê hinekî diguherîne û 3 zimanên hêremî/zaravayan dike forma serjimarê û di serjimara 1965an de formên zimanê Kurdî wek çar ziman tê nîşankirin. Bi dîtina me di vir de armanc ev e ku bikaribe bingeha polîtîkayên xwe ser Zazayan ava bike. Bi vê pirsê êdî dewlet dizane li ku derê çend Kurdên Zaza dijîn û li gorî van jimaran wê polîtîkayên xwe yên ku Zaza wek miletekî din dide nasandin û dixwaze Kurdên Zaza jî tevgera gelê Kurd dûr bixe bimeşîne.

Dema ku mirov li bajarên Kurdistanê dinihêre di serjimara 1927an de li bajarên wekî Meletî, Xarpêt/Elezîz û Erzinganê gelek mirov kurdîziman/kurdîzan in. Lê di halê heyî de li van bajaran hindik mirov hene ku bi Kurdî dizanin. 88 sal berê gelê Xarpêtê ji nîvî bêhtir (%52) û li Meletî jî %42 kurdîziman bû; lêbelê îro Kurdên wê derê ji aliyê dewletê ve gelekî hatine bişaftin û hejmara mirovên ku îro Kurdî dizanin pirr kêm e: Bi vê mînakê mirov dikare serkeftina encamên polîtîkayên bişaftînê yên dewleta Tirk li ser bajarên Kurdistanê bibîne. Li gorî qanûnnameya ku ji bo serjimarê hatiye amadekirin û beyannameyên ku Îsmet Paşa nivîsandine mirov dibîne ku rêveberên dewletê her kesî wekî Tirk dibînin û axa Tirkiyeyê jî wekî axeke pîroz dihesîbînin. Bi encamên serjimarê dewlet cara yekem der barê wesf û hejmara Kurdan de agahdar dibe û di polîtîkayên bişaftîna Kurdan de dê van daneyan her dem bi kar bîne. Îhtîmaleke mezin ku dewlet ji encamên serjimarê ditirse û Îsmet Paşa di sala 1935an de dişîne sefera Kurdistanê. Îsmet Paşa vê demê rapora xwe ya navdar a bi navê "Kürt Raporu" amade dike. Wekî din di vê serjimarê de xaleke din ya hêja ku divê li ser bê sekinandin meseleya Dêrsimê ye ku ew di lîsteya bajaran de cih nagire. Li ser vê behsê em dikarin bibêjin ku dewleta Tirk hê jî otorîteya xwe li vê herêmê qayîm nekiriye.

Bi vê gotarê em der barê hejmara Kurdan de dibin xwediyê hin agahiyan. Her çend ev serjimar di hin xalan de xwediyê hinek kêmasiyan be jî, dîsa girîng e. Bi taybetî pirsîna zimanê zikmakî rê li ber hin şîrove û nêrînan vedike. Em dizanin ku 1.187.446 kesan xwe wekî kurdîziman dane nîşandayin. Di ronahiya zanyariyên dîrokî de em dizanin her çend ne mimkûn be jî li gorî van belgeyan di sala 1935an de 29 kes dikarin bi Kurdî bixwînin û binivîsin.

**Di Serjimara Yekemîn ya 1927an de Gelheya Bajarên Kurdistanê**

| **Bajarê Erziromê/Erzurum Vilayeti** | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Erziromê/Erzurum Merkezi | 38356 | 39610 | 77966 |
| Îspîr/İspir | 17660 | 14618 | 32278 |
| Oltî/Oltu | 18422 | 18222 | 36644 |
| Hesenqele/ Pasinler | 17366 | 17535 | 34901 |
| Tercan/Tercan | 17502 | 16350 | 33852 |
| Xinûs/Hınıs | 11491 | 11542 | 23033 |
| Tortûm/Tortum | 16379 | 15323 | 31702 |
| **Yekûn/Toplam** | **137176** | **133200** | **270376** |

| **Bajarê Erzinganê/Erzincan Vilayeti** | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/ Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Erzinganê /Erzincan Merkezi | 26447 | 25342 | 51789 |
| Pilemor,Pilemûriyê /Pülümür | 5905 | 5119 | 11024 |
| Gêrganis/ Refahiye | 7534 | 6616 | 14150 |
| Kuruçay | 5294 | 3903 | 9197 |
| Kemah/Kemah | 7554 | 5795 | 13349 |
| Gêxî/Kiği | 14168 | 13926 | 28094 |
| Qisle/Nazimiye | 3126 | 3241 | 6367 |
| **Yekûn/Toplam** | **70028** | **63942** | **133970** |

| Bajarê Mêrdînê/Mardin Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/ Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Mêrdînê/ Mardin Merkezi | 23312 | 24309 | 47626 |
| Cizîra Botan,Cizîr/ Cizre | 13595 | 12155 | 25750 |
| Dêrika Çiyayê Mazî/ Derik | 8181 | 6930 | 15111 |
| Serêkanî/Resuleyn | 48 | 421 | 469 |
| Stewr/Savur | 14082 | 13581 | 27663 |
| Midyad/Midyat | 16270 | 15674 | 31944 |
| Nisêbîn/Nusaybin | 6050 | 6372 | 12422 |
| Kercos/Gerçüş | 10842 | 10951 | 21793 |
| **Yekûn/Toplam** | **92380** | **90393** | **182773** |

| Bajarê Rihayê/Urfa Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/ Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Rihayê/ Urfa Merkezi | 29399 | 29833 | 59232 |
| Bêrecûk/Birecik | 15997 | 15428 | 31425 |
| Heran/Harran | 6347 | 6777 | 13124 |
| Pirsûs/Suruç | 9114 | 10338 | 19452 |
| Girê Sor/ Siverek | 22516 | 20828 | 43344 |
| Wêranşar/ ViranŞehir | 6256 | 6065 | 12321 |
| Curnê Reş/ Hilvan | 6139 | 6039 | 12178 |
| Yaylak | 8629 | 8834 | 17463 |
| **Yekûn/ Toplam** | **104397** | **104142** | **208539** |

| Bajarê Mereşê/Maraş Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/ Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Mereşê/Maraş Merkezi | 34328 | 35699 | 70127 |
| Elbîstan/ Elbistan | 27091 | 26325 | 53416 |
| Andirîn/ Andirin | 6147 | 5986 | 12133 |
| Pazarcix/ Pazarcık | 14036 | 14528 | 28564 |
| Goksun/ Göksun | 10580 | 10138 | 20718 |
| **Yekûn/Toplam** | **92282** | **92676** | **184958** |

| Bajarê Meletî/Malatya Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Meletî/ Malatya Merkezi | 38678 | 36432 | 75110 |
| Argan/ Akçadağ | 18946 | 17527 | 36473 |
| Şiro/ Pötürgê | 21893 | 18456 | 40349 |
| Hisnê Mensûr/Hısnemensur | 23363 | 22729 | 46092 |
| Hekimxan/Hekimhan | 16404 | 14585 | 30989 |
| Erebgir/ Arapkir | 12472 | 9306 | 21778 |
| Kolik/Kahta | 15883 | 16136 | 32019 |
| Egin/ Kemaliye | 13419 | 9556 | 22975 |
| **Yekûn/ Toplam** | **161058** | **144727** | **305785** |

| Bajarê Wanê/Van Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/ Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Wanê/ Van Merkezi | 10811 | 11737 | 22548 |
| Erdîş/Erciş | 8803 | 9584 | 18387 |
| Elbak/Başkale | 2642 | 2522 | 5164 |
| Şax/Çatak | 1673 | 1709 | 3382 |
| Westan/Gevaş | 5558 | 5780 | 11338 |
| Bêgirî/Muradiye | 2922 | 3968 | 6890 |
| Mehmûdîye-Sêre/Mahmudiye | 3551 | 4177 | 7728 |
| **Yekûn/Toplam** | **35960** | **39477** | **75437** |

| Bajarê Xarpêtê/Elaziz Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Xarpêtê/Elaziz Merkezi | 40862 | 39735 | 80597 |
| Pulur/Ovacık | 2663 | 2694 | 5357 |
| Baskîl/ Baskil | 6859 | 6039 | 12898 |
| Palî, Palo/Palu | 18117 | 17375 | 35492 |
| Pêrtag/Pertek | 7135 | 6811 | 13946 |
| Çemişgezek/Çemişgezek | 7438 | 6266 | 13704 |
| Çewlik - Çolîk/Çapakçur | 5190 | 5324 | 10514 |
| Xozat/Hozat | 5023 | 4935 | 9958 |
| Keban/Keban | 1980 | 1584 | 3564 |
| Dara Hênî/ Genç | 784 | 1092 | 1876 |
| Mazgird/Mazgirt | 7804 | 7922 | 15726 |
| Maden/Maden | 5070 | 4931 | 10001 |
| **Yekûn/Toplam** | **108925** | **104708** | **213633** |

| Bajarê Bazîdî, Agirî/Bayazid Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê /Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Bazîdî, Agirî/Bayazid Merkezi | 9420 | 11047 | 20467 |
| Îdir/ Iğdır | 11749 | 13218 | 24967 |
| Zêdkan/ Eleşkirt | 3952 | 4325 | 8277 |
| Giyadin/ Diyadin | 5659 | 6122 | 11781 |
| Tutax/ Tutak | 2772 | 2920 | 5692 |
| Qerekose /Karaköse | 7952 | 13391 | 21343 |
| Kulp | 5672 | 5363 | 11035 |
| **Yekûn/Toplam** | **47176** | **56386** | **103562** |

| Bajarê Hekarî/Hakkari Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Hekarî/Colemerg Merkezi | 3403 | 3843 | 7246 |
| Bêşebab/Beytüş'şebap | 5814 | 7069 | 12883 |
| Şemzînan/Şemdinli | 706 | 1090 | 1715 |
| Gever/Yüksekova | 1466 | 1706 | 3172 |
| **Yekûn/Toplam** | **11389** | **13627** | **25016** |

| Bajarê Bedlîsê/Bitlis Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Bedlîsê/Bitlis Merkezi | 8023 | 10594 | 18617 |
| Xelat/Ahlat | 3961 | 4296 | 8257 |
| Kop/Bulanık | 2961 | 3040 | 6001 |
| Xîzan/Hizan | 4121 | 4224 | 8345 |
| Motkî/Mutki | 5587 | 5400 | 10987 |
| Mûş/Muş | 10324 | 11090 | 21414 |
| Milazgir/Malazgirt | 3154 | 3740 | 6894 |
| Gimgim/Varto | 4984 | 4810 | 9794 |
| **Yekûn/Toplam** | **43115** | **47194** | **90309** |



| Bajarê Sêrtê/Siirt Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Sêrtê/Siirt Merkezi | 1112 | 13631 | 24743 |
| Dihê/Eruh | 7915 | 6435 | 14350 |
| Qubîn, Bişêrî/Beşiri | 6778 | 6161 | 12939 |
| Xesxêr/Pervari | 3232 | 2985 | 6217 |
| Kufra/Şirvan | 4803 | 4649 | 9452 |
| Şirnex/Şırnak | 5342 | 5170 | 10512 |
| Qabilcewz/Sason | 5180 | 4129 | 9309 |
| Xerzan/Garzan | 7370 | 6745 | 14115 |
| **Yekûn/Toplam** | **51732** | **49905** | **101637** |

| Bajarê Amedê/Diyarbekir Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê /Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Amedê/ DiyarbekirMerkezi | 48123 | 49874 | 97997 |
| Çermûg/ Çermik | 9182 | 7998 | 17180 |
| Farqîn/ Silvan | 13366 | 13040 | 26406 |
| Erxenî/ Osmaniye, Ergani | 9680 | 9027 | 18707 |
| Pasûr/ Kulp | 5921 | 5294 | 11215 |
| Licê/ Lice | 10405 | 11394 | 21799 |
| **Yekûn/ Toplam** | **96677** | **96627** | **193304** |

| Bajarê Sêwazê/Sivas Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê /Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Sêwazê/ Sivas Merkezi | 28855 | 27325 | 56180 |
| Şarqije /Sarkışla, Tünüs | 26951 | 23206 | 50207 |
| Hafîk/ Hafik | 19683 | 18043 | 37726 |
| Dîvrigî/Divriği | 14229 | 10943 | 25172 |
| Darende/Darende | 12763 | 10934 | 23081 |
| Koçgirî/ Zara | 25044 | 22727 | 47771 |
| Qenxal/ Kangal | 17405 | 16003 | 33408 |
| Girîn /Gürün | 10000 | 8768 | 18768 |
| Norxan/Yenihan | 19901 | 17527 | 37428 |
| **Yekûn/Toplam** | **174831** | **154910** | **329741** |

| Bajarê Entab/Gaziantep Vilayeti | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Entabê/ Gaziantep Merkezi | 44973 | 43823 | 88796 |
| Behisnî/Besnî | 16282 | 14445 | 30727 |
| Kilîs/Kilis | 23029 | 22732 | 45761 |
| Bêlqîs/ Nizip | 24122 | 24089 | 48211 |
| **Yekûn/ Toplam** | **108406** | **10589** | **213495** |



| **Bajarê Qersê/Kars Vilayeti** | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Navçeyê/Kazanın İsmi** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Navenda Qersê/Kars Merkezi | 11585 | 12717 | 24302 |
| Erdexan/Ardahan | 11585 | 12717 | 24302 |
| Zarûşad/Arpaçayı | 12365 | 13173 | 25538 |
| Duxur/ Posof | 11982 | 12318 | 24300 |
| Çildar/Zirzûna, Çıldır | 9060 | 9760 | 18820 |
| Qamûşan/Sarıkamış | 16129 | 19001 | 35130 |
| Qers/Kars | 16442 | 21662 | 38104 |
| Qaxizman/Kağızman | 8335 | 8765 | 17100 |
| Mêrdînik, Gole/Göle | 10908 | 11262 | 22170 |
| **Yekûn/Toplam** | **96806** | **108658** | **229766** |

| **Li Gorî Bajaran Gelheya Kurdistana Bakur Vilayet İtibari ile Türkiye Kürdistanı Nüfusu** | | | |
|---|---|---|---|
| **Navê Bajaran/Vilayet İsimleri** | **Jin** | **Mêr** | **Yekûn** |
| Erzirom/ Erzurum | 137176 | 133200 | 270376 |
| Erzingan/ Erzincan | 70028 | 63942 | 133970 |
| Xarpêt/ Elazığ | 108925 | 104708 | 213633 |
| Riha/ Urfa | 104397 | 104142 | 208539 |
| Agirî, Bayazid/Ağrı | 47176 | 56386 | 103562 |
| Bedlîs/ Bitlis | 43115 | 47194 | 90309 |
| Hekarî/ Hakkari | 11389 | 13627 | 25016 |
| Amed/ Diyarbekir | 96677 | 96627 | 193304 |
| Sêrt/ Siirt | 51732 | 49905 | 101637 |
| Sêwas/ Sivas | 174831 | 154910 | 329741 |
| Entab/ Antep | 108406 | 105089 | 213495 |
| Qers/ Kars | 96806 | 108658 | 205464 |
| Mêrdîn/ Mardin | 92380 | 90393 | 182773 |
| Mereş/ Maraş | 92282 | 92676 | 184958 |
| Meletî/ Malatya | 161058 | 144727 | 305785 |
| Wan/ Van | 35960 | 39477 | 75437 |
| **Yekûn/ Toplam** | **1.432.338** | **1.405.661** | **2.862.301** |

**Li gor Gelheya 1927an Rewşa Zimanê Kurdî[24]**

| **Bajar Hejmar** | **%** | **Bajar Hejmar** | **%** |
|---|---|---|---|
| Hekarî 17.005 | 88.94 | Entab 16.348 | 7.58 |
| Wan 57.723 | 76.60 | Cebelîbereket[25] 7.211 | 6.70 |
| Bedlîs 67.678 | 74.67 | Kirşehir 8.160 | 6.43 |
| Sêrt 75.962 | 74.16 | Aksaray 8.141 | 6.41 |
| Amed 132.209 | 68.78 | Ankara 21.430 | 5.39 |
| Mêrdîn 109.841 | 60.86 | Çorum 12.311 | 4.96 |
| Beyazîd 60.926 | 58.26 | Konya 21.396 | 4.24 |
| Xarpêt 112.493 | 52.88 | Amasya 3.256 | 2.83 |
| Riha 182.788 | 42,06 | Adana 5.744 | 2.52 |
| Meletî 28.323 | 41.81 | Yozgat 5.020 | 2.40 |
| Erzingan 54.877 | 41.47 | Tokat 6.080 | 2.31 |
| Qers 42.945 | 20.96 | Kayseri 4.780 | 1.90 |
| Meraş 26.857 | 14.37 | Gümüşhane 1.943 | 1.59 |
| Erzirom 36.422 | 13.47 | | |
| Sêwas 42.271 | 12.82 | **Yekûn: 1.170.140** | |

## Jêrenot

1 Sibel Yardımcı-Ş.Arslan, "1930'ların Biyopolitik Paradigması: Dil, Etnisite, İskan ve Ulusun İnşası", *Doğu Batı*, hej. 44, 2008, r. 142.
2 İlhan Tekeli, "Osmanlı İmparatorluğu'ndan günümüze nüfusun zorunlu yer değiştirmesi ve iskan sorunu", *Toplum ve Bilim*, hej. 50 (havîn 1990), r. 63
3 28 Teşrinievvel 1927, *Umumî Nüfus Tahrîrî*, Mufassal Rakamlar, Ankara 1927, Başvekalet Merkezi İstatistik Müdiriyyeti Umumîyesi Neşriyatından, Aded, 2.
4 28 Teşrinievvel 1927, *Umum Nüfus Tahriri*, Fasikül III, Usuller, Kanun ve Talimatnameler, Neticelerin Tahlili. Vesika 9, Ankara, 1929. Başvekalet Müdevvenat Matbaası, r. 117.
5 Ş. Arslan, S. Yardımcı, M. Arpacı, Ö. Gürpınar, *Türkiye'nin Etnik Coğrafyası 1927-1965 Anadil Haritaları*, weş. Mimar Sinan Üniversitesi, 2015. r. 65.
6 Fuat Dündar, *Türkiye Nüfus Sayımlarında Azınlıklar*, weş. Doz, 1999, r. 70.
7 Ş. Arslan, S. Yardımcı, M. Arpacı, Ö. Gürpınar, *Türkiye'nin Etnik Coğrafyası 1927-1965 Anadil Haritaları*, r. 156.
8 28 Teşrinievvel 1927, *Umumi Nüfus Tahririri*, Vilayet, Kaza, Şehir ve Köyler İtibariyle Türkiye Nüfusu, Merkezi İstatistik Müdüriyeti Umumiyesi Neşriyatindan 3, 1928, Türk Ocakları Merkez Hey'eti Matbaası.
9 28 Teşrinievvel 1927, *Umum Nüfus Tahriri*, Fasikül III, Usuller, Kanun ve Talimatnameler, Neticelerin Tahlili, Ankara, 1929. Başvekalet Müdevvenat Matbaası. r. 31.
10 Hekarî, Wan, Bedlîs, Sêrt, Amed/Diyarbekir, Mêrdîn, Beyazid/ Agirî û Xarpêt/Elazîz.: Ş. Arslan, S. Yardımcı, M. Arpacı, Ö. Gürpınar, *Türkiye'nin Etnik Coğrafyası 1927-1965 Anadil Haritaları*.
11 Riha, Meletî û Erzingan.
12 Erzirom, Erzingan, Xarpêt, Riha, Agirî, Bedlîs, Hekarî, Amed, Sêrt, Sêwaz, Entab, Qers, Mêrdîn, Mereş, Meletî û Wan.
13 Türkiye Cumhuriyeti Başvekalet İstatistik Umumî Müdürlüğü, 28 Teşrinievel 192, *Umumi Nüfus Tahriri*, Fasikül I, Mufassal Neticeler, İcmal Tabloları, Ankara, 1929, Hüsnütabiat Matbaası, İstanbul.
14 *Nüfus Sayımları 1927-1950*, İstatistik Özetleri, No: 8, T.C Başvekalet İstatistik Umum Müdürlüğü, Nisan, Ankara, 1953, r. 12.
15 M. Malmisanij, *The Past and the Present of Book Publising in Kurdish Language in Turkey*, 2006 http://www.npage.org/IMG/pdf/Turkey.pdf; Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, weş. Peywend, Stenbol, 2015.
16 28 Teşrinievvel 1927, *Umum Nüfus Tahriri*, Fasikül III, Usuller, Kanun ve Talimatnameler, Neticelerin Tahlili. Vesika 9, Ankara, 1929. Başvekalet Müdevvenat Matbaası, r. 24.
17 Hekarî, Wan, Amasya, Bedlîs û Mêrdîn.
18 Şükrü Aslan, "Sahi, Devlet Dersim'e Gidemiyor muydu?", *Kürt Tarihi*, hej, 17, r. 16.
19 Türkiye Cumhuriyeti Başveklet İstatistik Umum Müdürlüğü, 28 Teşrinievel 1927, *Umum Nüfus Tahriri*, Fasikül II, Mufassal Neticeler, Kadro IV Nüfusun Ana Lisanı İtibariyle İnkisamı, r.116-18.
20 *Hînkerê Zimanê Kurdî*, Hêvî Civata Talebeyên Kurdan 1921, Amadekar: Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Bgst, İstanbul, r. 35.
21 Harputlu H.B, "Şerait-i Sıhhiyye", *Hetawî Kurd*, hej. 3, 1914, r. 17.
22 Hans-Lukas Kieser, *Iskalanmış Barış: Doğu Vilayetleri'nde Misyonerlik Etnik Kimlik ve Devlet 1839-1938*, weş. İletişim, 2010, r. 611
23 Kemal H. Karpat, *Ottoman Population 1830-1914, Demographic and Social Characteristics*, The University of Wisconsin Press, 1985, r. 170-75; Armenian Activities in the Archive Documents 1914-1918, volume I. Ankara Genelkurmay Basim Evi, 2005, r. 605-09. https://yadi.sk/d/pTIJtGuedjJwShttp:///h.
24 Cihên ku çawaniyên wan ji 1 kêmtir e di vê tabloyê de cih negirtiye.
25 Cebelîbereket, bi navê xwe yê îro Osmaniye ye.

# Çi dibe loo zemano

BERKEN BEREH

Tu şitleke binevşê bûy xwedêgiravî,
Konê xwe vedayî di dilê geliyekî.

Suretek te bû her hal; girover û rewnaq,
Heyva her şev şivan dibirin şevînê.

Xemgînî û xeşbextiya dîdara dildarên,
Li bajarên min navê wan nebihîstî.

Wek heza di belavbûna mija sibatê,
Dilê te, destê te, çavên te fireh û geş dibû.

Ez her dikarim bikim hawar piştî baranê,
Her ku keskesor bişibe te li esmanî.

Û zanim têr nake ev jiyana tenha û tirş,
Bo hêmayek di rengê şêrejina axê radimûse.

Çi dibe looo zemano,
Me jî veşêre di depa sîngê xwe de!